

Berlin, di 7.10.1991 de

Nameyeke vegiri ji bona Birayê minî şérîn Mesud Berzani!

Birayê hêja û xweşevist!

Ji mêt de min dixwest, ku ez ji bona te bidim nivisandin; ji ber birastî min zor bêriya we kirye û ez pir hêvidarim, ku ez bikaribim ji bona bal we bêm. Hoyê bergirê heri vê nehiştin hatina min êş û azara çavên minin Tevlivêji dilê min pir dibi je ku ez ji bona nik wê bêm, bi nêziki bîr û baweriyêñ xwe him ji bona te û himjî ji bona tevaya Endamên Komitiya Nawendî bidim derxistin, belki ji wanen piçekî sûd û kar ji bona Welat û Miletê me bêtin wergirtin.

Giringbûna derbasbûna demê li ser van rudanên gewreyî giran û mêtjûyi de li ser me tevan de, her yek li gora cihê wî de, her yek li gora zanebûn û bextê wî de dide neçarkirin, ku em tevaya bîr û baweriyêñ xwe li ser rewş, zînetâ Welêt û xebata xwe de bi givaştî û hêjî bêtir bi gihaştî ve bidin derxistin.

Bi vê mebest û hêjî bêtir bi vê armancê ev nameya hanê ji bona te, Birayê şérîn û xweşewist ji nava cerg û hinavêñ min û hêjî bêtir ji tevaya têgihştina min di rûpelên pir tîrş û tal de di tevaya bedbextiya mêtjûwa Miletê Kurd de hatîye nivisandin.

Raste, ev nameya hanê di vî warî de ne nameya pêsiye, ya ku ew ji bona we hatîye nivisandin. Beri vê di sala 1983 de Sê nameyêñ din bi hevbeşî ligel Kak Felek de ji bona we hatin nivisandin. Ew Başin yanjî xerabin, hîç gûman têde niye, ku ew di xebata Partî de belgeyêñ mêtjûyîne.

Kak Felek careke din bi neçarı û bi wî perê dilsozî ji bona te nameyeke taybetiyî pir vekirî û bi dûr dirêjî ve li ser rewş, zînet û şêweyêñ pêwistî de di reweşt û rewenda meyî neha de, hêjî bêtir di reftara me de ligel Mîrî de dayite nivisandin. Ez jî ji dil û can û bi xurtî ve pişta wan bîr û bawerîyan didim girtin; ji ber ku ew rastin û di nava wan bîr û baweriyêñ hanê de tevaya qazanc, kar û berjwendîya Partiya me, Miletê me û xabata me têde tête dîtin û ew ji me re zemineke baş û bi rêk û pêk ji bona biserkîtina xebata me di encamê dawî de didin durustkirin.

Birayê Hêja! Ez naxwazim li vê derê de careke din wan bîr û baweriyêñ Felek dubare bikim. Bi rasti ez duxwazim, ku ez bi rast û durûst ji bona ser cewhera mebestê bêm. Dibe, ku şêwê çûna min û têgihştina min ji bona vê mebestê û armanca xebata me zû bi zû neyête liberketin. Tevlivêji ez hêviya libuharinînê ji te bi dil û can dikim. Gava ku ez piçekî bi lez û bez hin ji bîr û baweriyêñ rasti kevnar careke din li vêderê de didim vegerandin û dubarekiran:

1. Armanca Xebata Netewê Kurd: Xebata Netewê Kurdi perçekirî mîna xebata hemû Miletêñ din di vê dunyayê de bi neçarı ew ji bona Azadî, Serxwebûn û Pêkanîna Dewleteke Miliyi Serbixwe tête kîrin. Serxwebûna Miletan û Pêkanîna Dewletêni Miliyi Serbixwe Qanûna serûştîyê ye. Serxwebûn nayête dan ew bi darê zorê û bi gorîyêñ giran tête sitendin. Pirbûn û kêmanîyêñ van gorîyêñ hanê ew her û her bi xwe bi zanebûn, dilsozî û dewlemendiya Miletêkî ve têtin

girêndan. Bedbextiya me her û her em nezanbûn; ji ber vê ji em her perişan, reben û belengaz di nava Welatekî pir dewlemend de bûn. Rêberên me - tevî hemû sertewandinê beramber wan gorîyên wanî mezin ji - piraniya wan nezanên me bûn; Nezanên me Rêberên me bûn; ji ber ku ew awêneya pêgihştina giştiyî Miletê me bûn. Rêber ew ji nava esmanan nayêtin xwar, lêbelê ew bi hemû başî û kêmaniyên xwe ve ji nava cerg û hinavên Miletê xwe ve têtin derketin. Ev rastiya tirş û tal li ser me de dide neçarkirin, ku em di hêjakirin û nerxkirina Rêberên xwe de li wan de di çarçopê dorhêl û dema wan de bidin temaşekirin. Ew bi xwejî Afirvan yanjî girtiyê dorhêla xwe ne. Dorhêla wan ji me re rast û durust pîvana Zanebûn û Nezaniya wan, Afirvanî û Girtibûna wan bi eşkere, diyar dide nişankirin. Ev rastiya dijwarî, talî rûpelên mêmûwa me bi neçarî li ser Rêberên meyi neha ji de dide neçarkirin, ger ku ew bi rasti Rêberên rast û durust bin û hêjî bêtir ger ku ew di rûpelên serpêhatiyên tirş û talî mêmûwa me de hatibin liberketin, ku ew guhpêdaneke pir gewre û giring bi pêwistî bi dorhêla xwe ve bidin dan, da ku ew bikaribin gorîyên Serxwebûnê kêm bikin û dema gihaştina wê kurt bikin.

2. Hemû Liberrabûn, Raperîn, Serhildan û Şüreşen me li Kurdistanê de bi giştî ve û di Sedsalên Nozdeh, Bîstan de bi taybetî tev bi carekê hatine hilweşandin û nabûdkirin; ji ber ku em ne yek bûn. Hoyen navxweyîyên me bi serên xwe bingehên bi sernekentinê me bûn. Hemû Mîrneşini û Serdarîyên Kurdistanê bi destên yarmetiya Kurd ji bona Dewleta Sefewî yanjî Dewlesta Osmanî ve hatin rûxandin.

Raste, hoyen derive roleke herî pir giring di Serxwebûna Miletan de didin listin, lêbelê li gora zanbûn, têgihiştina min de di mêmûwa Serxwebûna Miletan de, bi taybetî di mêmûwa vi Dû Sed salên dawî de hêjî wan Miletak di Encamê dawî de bi Serxwebûna wi ve bi rasti û durustî ve nedane vegihaştin. Belê Dibe, ku di mêmûwê de di demeke kurt de lihev bête rasthatin, ku ew hoyen derveyî hanê weha bidin derxistin, ku ji bona Miletakî Serxwebûna wi jê re didin diyarîkirin, lêbelê di encamê dawî de ew "Diyarîkirina" hanê bi rasti cihê Serdareki Bêgane bi cihê Serdareki dini Bêganeyî hêjî pistir dide veguhertin. Ser li nû ve careke din ew Miletê bedbext neçarî duçarî dana gorîyên pir giran û mezin ji bona Serxwebûna xwe dibe. Wehaji gerjî ku mero nehaji ji xwe re li piraniya van Dewleten Serbixwe de di Cihana Sêyem de bide temaşekirin, ev rastiya tirş û tal di tevaya xwe de ji me re tete diyarkirin. Destana wanî piri giran hêjî nehatiye bidawîkirin, lêbelê hêjî herojî ji nûvejî bi pileyekî hêjî bilindtir destpêdike. Ji me re diyar dibe, ku piraniya wan Dewletan nema dikarin Miletê xwe bi nan û av bikin. Bi hezaran Sed hezaran Mirov sal bi sal ji birçibûnan dimrin. Ev Destana Mirovaniyê di vi Sedsalê me de nayête bidawîkirin, ger ku ev Miletê hanê bi rasti û durustî bi Serxwebûna xwe ve neyêtin vegihaştin.

3. Miletê Kurd ji sala 1514 Z. de di nava Dewleta Osmanî û Sefewî de her û her goga ber kaşûwên wan bû. Herdû Dewleten Mezin ji xwe re Kurdistanâ me bi qada ceng û şer kiribûn û Kurd ji wan re bi erzanî, hêjî bêtir bi bê vacî ji şûr û mertal bû. Kurd bi xwe ji bona wan xwe di nava xwîna hev de didan vegevizadin û nabûdkirin.

Di sala 1916 de li ser bingehê Peymana Sayks-Piko de li Bajarê Bêrûdê de ser li nû ve de Kurdistan ji dêlva Du perçan ew bi Çar Perçe bû û ew di nava Çar Dewletan de hate parvekirin. Dirbûna van Dewletê Dagîrkerên Talankerên Erebênu nuh tevaya Dirbûn û Hovîtiya Dewleta Osmani û Sefewi zor li paş xwe de dane hiştin.

Em pir dereng mîna hercar di siyaseta Rojhilat de bi giştî û di siyaseta beramber Kurdistanê de bi taybeti hatin liberketin. Hemû Bendêni Sêver di sala 1920 de bi Bendêni Lozanê ve di sala 1923 de hatin veguhertin û em destvala ji ber û encamên Cenga Cihani Yekem nebes tenê bê pişk û par hatin derketin, lêbelê hêjî bêtir ji nû ve Welatê me Kurdistanâ Turki, ïraq û ïranê bi qada Ceng û şer bûn. Bi hezaran sed Hezaran ji Mirovan ji bo Mafeyê Kurdi rewa di manê de, di rûmetê de, di serxwebûnê de hatin gorîkirin û pir ji Rêberên Dilsozêni wî bi sépiyan ve hatin bidarvekirin.

Weha careke din mîna hercar me xwe bi neçarı yanjî bi nezanî li ser soz û peymanêni Turk, Ereb, ïranî de xapandî dît. Careke din mîna hercar em bi ser guh û rûçikên Feleka bêbexte de hatin xwar. Careke din ji mîna hercar em bi Felekê hatin daketin, me pir sitran, Meqam, lori, Xweşxwanê dilsütandî pê dane gotin. Lê tê bêje, ku ev Miletê bedbext, reben û belengaz bi başî ve di rastîya ketinêni xwe de hatiye gihaştin, ev bi xwe jî tanî nehajî hêjî - bi kîmanî ji min re - nayête dîtin.

Me pir mal û can bi merdayeti bênenmûne di Rojhilata Navîni de di vê rîça rûmetê de ji bona mafeyen Mirovaniya xwe û ji bona Serxwebûna Kurdistanê dayite gorîkirin. Tevlivêji berê xebata me her û her bi ketinê ve hatiye dawîkirin. Dujminêni me li ser gewde, laş û serêni bi hezaran sed hezaran ji Kurdêni Bêguneh ji xwe re govend, dilan û şahî lidardixistin. Wan şabaş dikirin, nav di xwe de didan û ji tevaya dunê re bêşermezari û bi rûreşî ve didan zanîn, ku ev Pêxwas, Keleş û Rêbirêni serêni çiyan careke din nema serêni xwe didin livandin û hildan. Hêjî bêtir wan li ser lat û zinarêni Araratê di sala 1937 de bi tipêni Latiniyê pir gewre ji xwe re didan neqîsandin: Vê Derê Goristana Kurdistanê ye.

Weha van Bêvac, Bêmeji, Guri û Kotiyêni dîrokê ji xwe re bawerdikirin, ku dê ew Miletêkî mîna Neviyêni Mîdyâ bi talankirina Dewlemendîya Welatê wî ve û bi kuştin û vegurandina bi Hezaran sed hezaran ji şerîntirin Kec û Kurêni wî ve bidin qirkirin. Vi karê dir û hov jî di seranseri mêmûwa me de teví li hemû golên hêstir û xwînê de di nava Welatê me de müyekî jî ji vîn û evînê Neviyêni Mîdyâ ji bona rûmeta xwe, ji bona Mirovaniya xwe, ji bona Azadî û Sexwebûna Kurdistanâ xwe û ji bona pêkanîna Dewleteke Miliyi Serbixwe nehatin daketin. Kurdan her car ji nû ve bi neçarı li ber man û nema xwe û rûmeta Welat û Mirovaniya xwe de didan dan.

Raste, ku em di vê xebata xweyî xwînavî de bisernehatin ketin, lêbelê Dujminêni me bi cavêni xwe her û her Raperînêni Kurdan didîtin. Di dawî de Çekêni qirkirinêyi berê nema ji bo Serdarêni Dagîrkerêni Ereb ji bona Talankirina Dewlemendîya Welatê me û bi taybeti Nefta Kurdistanâ me û Bend û Kolekirina Miletê me didan têrkirin; ji ber ku Netewê Kurd li Kurdistanâ ïraqê de bi mîrxasî, bi gernasî, hêjî bêtir deha bi hêz û hinertir bi Yekdestî, bi Yekdili di Berê Neştimanî de mîna Dilêran bi

piştivanî ji seranseri Kurdistanê bihust bi bihust, pê bi pê, gav bi gav xakê pakê Kurdistanâ şerîn ji bin Tapanêni Gemarîyi Huştirêni Faşiyêni Ereb careke din didan pakkirin. Pêşmergên me ronîniyêni Çavêni me, Rewanêni Jîna me, Şûr û Mertalêni Rûmate me ji nû ve ji me re Agirê jînê, Vîn û Evinê li Kurdistanâ me de didan dadan. Ji nû ve careke din piştî demeke tarîyi piri dirêj de di nava Buhuştâ Evsanêni Ereb de: Rastî, Paki û Lébuhrandin di nava Kurdistanê de wan ji me re datin kat û hîmkirin.

Ji sala 1987 de li Kurdistanâ İraqê de Faşiyêni Pasiyêni Ereb, Sedamê Hov û Mirovxxwer dest bi barandina Çekêni Kêmyawî kir. Bi hezaran deh hezaran ji Kurdêni Bêguneh, Menal, Pîr, Keç, Afert bi hev re bi ber Çekêni Kîmyawî ve hatin ketin û di dawîya Havîna Sala 1988 de Heremêni rizgarîkiri ji ber pirbûna avêtina çekêni kêmyawî bi carekê hatin valakirin û bi hezaran sed hezaran ji Kurd ji bona Turki û İranê hatin bazzan. Wî Xwest Kurd bi Çekêni Kîmyawî û Biyolocî bide qirkirin, da ku ew tevaya Dewlemendîya Welatê me bi carekê û her û her ji bona xwe bidin talankirin. Raste, Miletê Kurd pir bi vî karê dir, hov hate êşandin.

Ev karê hanê di mêmüwa mirovanîyê de ji bona qirkirina Miletêkî bi Çekêni Kîmyawî ve nebiryariya pêşibû. Di sala 1938 de li Bajarê Berlin de ji Dewlewta Nazi ev ji bona qirkirina Cuhan date biryardan. Ji sala 1939 tanî 1945 de 6. Milyon Cuhu ji Serjimara 11 Milyon li seranseri Cihanê de li ser destêni Elmanêni Nazi de hatin qirkirin. Tev li vî karê dir û hov jî de Cuhu ji Dunê nehatin qirkirin. lê Dewleta Nazi ji rîş û rehan de hate qirkirin. İro Dewleta Cuhu yekek ji xurtirîn Dewletêni Rojhilata Navînê ye.

Di Mêmüwa Kevnar de Dewleta Babilon û Nineva Xurttirîn û bi hêztirîn Dewletêni dema xwe bûn. Wan jî her xwestin, ku ew bi darê zorê Kurdan bidin qirkirin. Di encamê dawî de û li ser destêni Kurd Babilon û Nineva ji ser ruwê zeminê hatin hilanîn. Bes û bi tenha şop û navêni wan di mêmüwê de man.

Her Mirovekî piçekî têgihşti baş dizane, ku belê Netewê Kurd bi bêtir ji 25. Milyonê xwe ve bi Çekêni Kîmyawî û Biyolocîyi Ereb nayêtin qirkirin. Raste, dê derdêni Kurd piri zorbin, raste, dê gorîyêni wan pir gewrebin. Lî Kurd bes bi ava xwe ma be, di encamê dawî de ne bes tenê tola Helebçe her wehaji pêreji Ereb divê tevaya Talaniya Kurdistanâ ji sala 1922 de ligel hemû ziyanîn pêxstî de bide vegerandin, eger na, pirbûna berdana avê ji bona Neviyêni Sedam re ne cî ne war li seren Çiyayêni Gotî têtin dîtin. Ji nû ve careke din Kundêni Babilon û Nineva li ser kavilêni Gund û Bajarêni wan dê bidin xwendin, kêm av bête berdan yanji neyête berdan, ne Çirav û Neji Melex ji bona wan dimînin. Segê Esfahanê ji nû ve bi neçarı dê li ser wan bête nûz nûzkirin.

Birayê Hêja! em mîna hemû Miletêni vê dunê ji dil û can ligel Dirawsêni xwe de bi dostanî, aşitî dixwazin bijin; ji ber em ji Miletê xwe hezdikin û baş dizanîn, ku di dostanîya Miletan de xweşî û bextiyari tête dîtin. Lîbelê ligel Cenawerekî mîna Sedam de bes Qanûna rewayî Hemurabî ya berî 1750 Salî B. Z. de dikare li vî Cenawerê Mirovxxwer de ber lêbide girtin. Tevlivêji Miletê Kurd di kêsa pêşî de mîna Dilêran li ber Sedam de rabû. Tevaya

Kurdistanê ji gemara Tapanêن Huştirên Faşiyêن Ereb dane pakkirin. Azadiya Kurdistan pîrî kurt bû, lêbelê ew xwena dirêj ji bona Serxwebûnê date bicihanîn. Sedamê Mirovxwer birindarê Cenga Dilava Farisi tevaya Dir û Hovitiya xwe, Kîna xweyî reş ne bes tenê beramber bi Kurdan, lêbelê ji beramber bi tevaya Mirovaniyê date derxistin. Wî xwest careke din Miletê Kurd li Kurdistanâ ïraqê bide qirkirin. Ji tirsa man û nemanê bi hezaran sed hezaran ji Mirovan ji nava cihêن xwe ji bo serêن çiyan di nava berf û baranê de û ji pirçibûna bi hezaran ji Zarokêن Berpêşiran, Pîr, Kal û Afret mirin. Vê destana Mirovanyê ji bona hebûna xwe ji bona parastina jîna xwe ji destêن Sedamê Dêwê Mirovxwer Bextê Mirovanyê date hejandin û lerizandin. Piraniya Mirovan li seranseri Dunyayê de Çi Reş, Çi Sipî bi Yek Dil û Can di Hewara Kurdistanê û Kurdan de hatin. Dest û Tapanên Sedamê Dêwê Mirovxwer kurtkirin û soz û peyman beramberi tevaya Bîr û Baweriya Cîhanê bi parastina Kurd di nava Kurdistanê de hate dan.

Belê Miletê me gorîyên pir mezin û giran li ser rêya rûmeta Mirovaniyâ xwe û Serxwebûna Kurdistanâ xwe de date dan; ji ber vê ji vi Miletê mîrxas, garnasê azadiyê û Serxwebûna Kurdistanâ xwe nav û deng di tevaya Cîhanê de date dan. Kes li vê Dunyayê de nema, ku ew li ser derd û kulêن Kurd û talankirina Kurdistanâ de ji bal Serdarêن Hov û Dîrî Turk, Îranî û Ereb nehatin agehdarkirin. Tevaya van Dewletên dagîrkerêن Kurdistan bi carekê bermaber bi tevaya Mirovanyê bi Hovitiya xwe ve û bi pêlêkirina Mafeyê Mirov li Kurdistanâ de hatin rût û tazikirin. Mîna wan rures hêjî nehatine dîtin. Di cara pêşî de him di mêtûwa Mirovanyê de û him ji di mêtûwa Kurdistanâ de weha bi Milyonan Mirov li ser Zarok û Menalên Kurd de digrin.

Ev hewara rast û durust ji bo pirsa Netewê Kurd û çarekirina wêna gewretirin hêz û hiner di ayinde de ji bona serxwebûna Kurdistanâ û pêkanîna Dewleteke Miliyi serbixwe dide pêkanîn. Ev hewara mezin û bi kîr ji seranseri Cîhanê ji me re hat; ji ber em li seranseri Kurdistanâ tev de bi Yekbûn. Ev Yekitiya han, ya ku pê xanî û hemû Dilsoz û Zanayên Kurd di seranseri mêtûwa Kurdistanâ de her û her dane daxwazkirin, bi rast û durusti xurtbûn, hêz û kîra vê yekitiyê ji me re hate derketin. Nema wan Rêberêن Qelp û Nezan dikaribûn ji Felekê bikirina gili û gazin û bêjin: Em bê Kesin. Em bê kes bûn; ji ber em nezan bûn, ne yek bûn.

Di vê rewş û zîneta hanê de Sedamê Mirovxwer destêن xwe ji bona çarekirina pirsiyariya Kurd bi aşitî date dirêjkirin. Tevi li hemû Dir û Hovitiya vi Mirovxwerê hanê ji Rêberîya Kurd pir bi dijwari destê xweyî aşitîyê ji bona çarekirina pirsa Kurd ji bona demekê date dirêjkirin. Ev destdirêjiya hanê belê ji Kurd re pîrî dujwar bû, lêbelê tevlivêjî ew bi xwe rast û durûst bû; ji ber Kurd di seranser mêtûwa xwe de her û her li ber mana xwe daye û her û her ji wi xwestiye, ku ew pirsiyariya xwe bi aşitî bide çarekirin û Kurd ji di nava Welatê xwe de bi rûmet, aşitî, xweşî û bextiyari ligel Dirawsên xwe de bijîn.

Belam Birayê hêja tanî vê roja hanê ji Sedam Qertelê Mirovxwer müyekî ji ji bona çarekirina pirsiyariya Kurd bi carekê ve bi pêş ve nehatîye û ew bi pêş ve ji ji bona çarekirina vê pêrsê û pirseke din ji nikare bê; ji ber ku di nava mejîyê serê vi

Mirovxwerê hanê de ne cihê aşîtiyê û nejî cihê Mirovaniyê jê re cih û war maye. Serê vî Ajdehakî Mejixwerê Ereb bi yarmetîya hemû Hêzên Beramber li îraqê de divê bête perçiqandin. Wê çaxê wê hingavê dibe, ku Pirsiyariya Kurd bi hajbûna Mîli ve û bi aşîti ve li Iraqê de ji bona demekê ve bête çarekîrin. Birayê Hêja! Nêt û mebesta vî Mirovxwerî, ku ew careke din mîna her çar Kurd bi soz û peymanê hîç û pûç bide xapandin û bi serdejî vê yekitiya Kurdi perest, dermanê derdêne me ji hev bide tar û markirin û Kurd ji vê piştgirtina Cîhanîyi zor bi hêz û hiner bide bêpişk û parkirin û Xebata Kurd li seranserî Kurdistanê de beramber tevaya Cîhanê bide bi beravêtin û Gelê Kurd careke din mîna her car di mêmûwa wî de xwe bi xwe û hev bi hev wan bide qirkin û nabûdkîrin.

Her li hevhatinek çend ji biçûk be, ger ku tevaya Kurd li ser bi yek be, ewaya bes û bi tenha li qazanc û berjewendiya Kurd bi xwe ye. Her li hevhatineke din nebes tenê dê ew biziyanâ Kurdan bi neçarı bête dawîkirin. lêbelê ji Kurd wê di nava xwîna hev de bête vegevizandin. Beramberî Cîhanê bi carekê wê ew bête rusar, rureşkirin û pirsiyariya wî û çarekîrina wê bi dehan sal wê bête bi paş ve xistin û tevaya xebata wî li seranserî Kurdistanê de wê bête beravêtikîrin.

Raste, ku Miletê Kurd li Kurdistanâ îraqê bi rastî ji şer naxwaze, ew dixwaze, ku ew bi aşîti di nava cih û warêne xwe de bête jiyandin. Evaya di her demekê de daxwaza Kurd bû. Wî rojekê ji rojan şer nexwestî ye. Wî her û her li ber man û nemana xwe de daye. Evaya tevaya rastiyê ye.

Lêbelê Birayê hêja! ev dê çî aşîti be, ya ku Kurd xwe bi xwe û beramberî hemû dunyayê ji bona aşîtiya Sedamê Mirovxwer û hajbûna ligel wî de hev bidin vegurandin? Ev ne aşîti ye, ev bi xwe destana Kurdan bi xwe ye. Belê ev careke din mîna her car bedbextîya nezanîya me bi xwe ye.

Ez hêvidarim, ku karê teyî herî pêşî dê ne ev Ewtomomiya hîç û pûç be, ya ku ew hêjibêtir li ser soz û peymanê Sedamê Mirovxwer de bi xwe ye, lêbelê bi her giraniyekê û bi her buhayekî dê parastina yekitiya Kurd bi xwe be. Evaya iro armanca mêmûyi li ser milên te ye. Eger Birayê hêja te ev date parastin, hîç gûman tê de niye, te ji me re hîmekî pir giran ji bona Serxwebûn û Pêkanîna Dewleteke Mili date bi bingehkirin.

Ewtomomi divê bes û bi tenha ji bona gavekê û hingavekê be. Ew tektîkekî rojane be; ji ber ew di encamê dawî de hîç û pûçe. Pirsiyariya Kurd hîç carekê ji caran ji pê nayete çarekîrin. Ewtomomi li ser bingehê tirazûya ceng û şer tê danin. Her roja ku ji bona Ewtomomi tête morkîrin; di wê rojê bi xwe ji de bi neçarı divê Kurd xwe ji bona şer bide amadekirin. Ewtomomi her û her bi şer û cengê tête aviskîrin; ji ber Çi ji Dewleta Dagîrker ji bona Ewtomomi jê bête sitendin ew zore, Çi ji bona Kurd ji Dewleta Dagîrker bête sitendin ew kême. Çi gava Dewleta Dagîrker bête bi hêzkîrin ew şer dike, da ku ew wan bidestketinê Kurdistanâ bi hêzkîrin, ew bi mafeyê xweyi perest dibîne, ku ew bêtir û bêtir mafeyen xweyi rewa bide bidestxistin. Li ser vê neçarıya hanê ew şerê serwxebûnê ji nûve lidar dide xistin.

Çarekirina Pirsiyariya Milî bes bi tenha xwe bi Çarenûsa Netewan yanî bi pêkanîna Dewleteke Milîyi Serbixwe tête çarekirin. Bêyî vê ne aşîti û nejî aramî di nava Welatekî de tête dîtin.

Weha divê ji bona Rêberên Kurd diyar be, ku tanî Kurdistan bi carekê jî neyête azad kirin û Dewleteke Milîyi serbixwe li seranserî Kurdistanê de neyête pêkanîn, ne aşîti û ne jî aramî li Kurdistanê û her wehajî li Îraqê, li Îranê, li Turkiyê û li Sûri de nayêtin dîtin. Kurd, Ereb, Turk û Îranî bivin yanji nevin, tanî ku Pirsiyariya Kurd li ser bingehê Serxwebûnê û Pêkanîna Dewleteke Milîyi serbixwe neyête çarekirin, dê bi neçarî Kurd ligel van Miletan her û her di şer û cengê de xwe bibînin. Ji ber vê jî dûr yanjî nêzîk pêşkevtina van Welatan nayête dîtin, ger demekê jî bête dîtin, careke din jî bi carekê ew pêşveketina hanê tête herifandin. Baştırîn nimûne li ser rastîya vê bîr û bawerîya hanê Rewş û Zînetâ Îraqê bi başî ji me re dide derxistin. Wê ji sala 1922 her û her dewlemendîya Welatê me û bi taybetî Nefta me daye talankirin û pê Beşê Erebî daye avakirin. Di cenga Îran û Îraqê de û hêjî bêtir di cenga Dilava Farisî de hemû talaniya Kurdistanê û hatina Îraqê bi carekê li ser date danîn. Hêjî ev nîna ye. Îraq nema bi ser xwe ve tê. Ew mîna Dewletekê hîç jê re ne ayinde û nejî pêşbînî tête dîtin.

Ez gûman dikim ev nemûneya han ji me re bi başî dide derxistin, ku ew Welatê Kurdistan di nava xwe de dana parvekirin, hîç aşîtiyê, aramîyê, demokrasîyê, mafê Mirov nabînîn, tanî ku pirsiyariya Kurd di Serxwebûnê de neyête çarekirin. Ew Dewletêni Dagîrker û Talankerên Kurdistanâ me ji me re her û her bergîrê pêşveketina me ne, em jî ji wan re bivin yanjî nevên her û her bergîrê pêşkevtina wanin. Hêgil dibêje: Civateke Azad Civateke din jérdest nade kirin. Marks vê bîr û bawerîyê ji Hêgil dide wergirtin û ew dibêjê: Miletikî Azad Miletikî din jérdest nade kirin. Çend ev Bîr û Bawerîyên hanê rastin û ji bona çarekirina pirsiyariya Milî çend pêwistin. Ji bona nimûne Emperetoriya Romanî, Osmanî, Nemsawî, Rusî, Ingilîzî...hd. tev de bi hev re ji ber neçarekirina pirsiyariya Milî hatin ruxandin.

Birayê hêja! Di seranserî mêmûwa me de mîna neha ji me Kurdan re weha Kês lênehatîye. Em hîç di mêmûwê de weha nêzîkî Serxwebûnê nehatine kirin. Tevaya Merc û Nîrên vê demê tev de ji bona Kurd û Kurdistanê likarin. Birayê hêja heyf û mexabin ji bona te, ku tu neha xwe bi vê Ewtomomiya Hîç û pûçî Sedam pê dide xerikkirin.

Raste, ku tu bi rastî û ji dil û can aşîtiyê ji bona Kurd û Ereb dixwaze. Ev karaya bi xwejî cihê rîzlegirtinê ye û ew pir bi nerxe. Lê Birayê min ev karê weha bilind ligel Mirovekî Ciwanmîr de tête kirin û ne ligel Mirovekî Mirovixerê mîna Sedam de tête kirin. Tevî başbûna armanca vî karî jî tu dema xwe pê dide windakirin.

Tevî li hemû kur û kêmanîyan de iro roja te û Kak Celale, ku hûn ligel hev de dest bi dest bidin xistin. Sitratîciya teyî Milîyi dûr û Tektîka Celâfiyî livandî bê Bav û Dê (Rastîya vê siyaseta hanê di nav Mîr de tête dîtin) pir bi başî jî hevdigirin û Herdû ligel hev de dikarin karekî pir lihevhatî û bi kér ji bona Serxwebûna Kurdistanê bidin bi hêvîkirin. Evaya kurtîya bîr û bawerîyên min ji bona te bûn. Ez hêvîdarîya Xwesî, Biserketin û Dîdar we dikim.

Birayê te Dr. M. S. Cuma

Nameyeke vekirî ji bona Mesud Berzanî li ser rûdanên Kurdistana Jêrîn de
Birayê Hêja û Xweşevist!

Ez bîr û bawerîyên xwe bi givaştî û hêjî bêtir bi gihaştî ve li ser têgihiştin û liberkevtina xwe
li ser bingehêن tirş û talîyên Mêjûwê ji bona ber destêن te didim danîn, da ku belkî piçekî tu
sûd ji xwe re ji wan bikaribe bide wergirtin:

1. Ev rûdanêن tirş, tal, bitirs û malwêran di Kurdistanê de ji dilxwazî û xweziya me
azadin. Ew teqandina kombûn û neçarekirina dijbûnê rabuhurandina me ne.
2. Armanca wan ji bal me nediyar û tevlihev hêjî têtin dîtin. Belam ew ji bal Celal
Talebanî ve hatine armanckirin û hêjî bêtir ew hatine bernamekirin û hêjî bi serdejî
ve ew bi zanebûn û şiyarî ve têtin bicîkirin.
3. Daxwaz û armanca wan li ser serê te ye, na hêjî bêtir ew rast û durust ji bona serê te
têtin ditin; ji ber bêyi vêna Celal Talebanî nikare bi Padışahê Kurdistanê ve bête kirin.
4. Ger ku ew bi vê armanca xwe ve bête gihaştin yanjî ew neyête gihaştin, bes
û bi tenha ve ew bi te ve tête girêdan. Bi saya nezanîya Siyaseta te dê ew bi armanca
xwe ve bête gihaştin û tu dê bi gorîyê nezanîya xwe ve bête kirin û hêjî bêtir dê
tevaya Binemala Berzanî û Hemû Berzanî bêtin qirkirin û bi Hezaran Sedhezaran ji
Kurdan ve li ser destên Polpotê Celalî dê bêtin kuştin û Kurdistana rengîn bi Golên
Xwînê ve dê bêtin dagirtin. Dê Mêjûvan li ser te bidin nivîsandin: Wî ji Dilpakîya
xwe, na ji Nezanîya xwe wî xwe, Binemala Berzanî, Berzanî û bi Hezaran ji baştîrîn
Keç û Kurêن Kurdistanê dane nabûdkirin; ji ber ku wî bi xurayı ve ew Hêz û Hinera
Mezin, Dilsoz, Gernas û Mêrxas ji destêن xwe dane berdan û wî ew di roja pêwist de
û di cihêن wan de nedan bikaranîn. Wî xwe bi Encûmen û Bangewazîyên hîc û pûç
ve didate xapandin. Serpêhatiya wîna mîna serpêhatiya Elî û Meawîya careke din bi
hemû tirş û talîyên xwe ve hate vegerandin. Elî bi Dilpakîya xwe ve, na hêjî bêtir û
rastir bi nezanîya xwe ve ji bona Nerijandina Xwîna Musulmanan ne bes tenê wî
xwe, serêن Hesen û Hisêن date liserkirin, lêbelê jî wî piranîya Binemala xwe jî li ser
destêن Meawî û Zarokêن wî de bigir hemû dane qirkirin. Bi vî rengî ve Binemala
Emewî bêtir ji Sed û Sî Salî ve di Welatên Rojhilata Ereb de date serdarîkirin.
5. Celal nebes tenê Hemberê te ye, lêbelê ew ji dil û can Dujmin û hêjî bêtir ew bi
hemû zanebûn û karêن xwe ve dildar û dilbijokê serê te ye; ji ber vê jî wî ev agirê
malwêranîyê di Kurdistana reben û belengaz de di vê gavê de bi xurtî û zanebûn ve
dayite lidarxistin, likarxistin û dadan.
6. Ev Agirê hanê bes û bi tenha ve dê bête temirandin, gava ku tu bi pêgîrî ve tevaya
Hêz û Hinerêن xwe ji bona pankirina serê vî Xuriyê hanê bide dagirtin û komkirin,
yanjî gava ku tu wîna bi Serdarê Kurtêlxwerêن Dergehvanêن Begdadê bide xelatkirin.
Bes û bi tenha ve û bi vî rengî ve Kurdistan bi rast û durust ve xwîn dê lê bête
rawestandin. Ew dê ji van Polpotan bête rizgarkirin û Gorîyên wê dê bêtin kêmkirin.
7. Evaya rast û durust iro ji te Birayê Hêja tête xwestin. Evaya daxwaza Gorîyêن
Kurdistanê û Berzanîyê Mezin ji te ye, da ku tu xwe, Milet û Welatê xwe ji van
Polpoten Xwînrij û Xwînmijêن Celalîyan bide parastin.
8. Tevaya Deqa Lawazîya te di iro de Birayê Hêja di Dudilî û Dorhêla te de, ya ku te
bi bidilbijandî ve li dora xwe de daye komkirin, tête dîtin. Tevaya giringbûn û
giranbûna kar û barêن Mêjûyî li ser te de ji bona man û nema te bi neçarî ve didin
neçarkirin, da ku tu bi kêmtrîn Gorî û kurtirîn Dem bi serkevtinê ve bête xelatkirin,
divê ku tu xwe ji vê Dudilîyê û piranîya Dorhêla xweyî hîc û pûç bi lez û bez ve bide
rizgarkirin û Dorhêla xwe bi zanetirîn, Dilsoztirîn û Mêrxastirîn Dost û Hevalêن xwe
ve bide dagirtin. Pir Mirovêن bi nav û bangêن Mêjûwê bi gorîyêن Dorhêla xwe ve
hatin kirin, ji ber ku ew bi derengî ve pê hatin şiyarkirin.

Berlin, di 31. Dezember 1992 de

Dr. M. S. Gouma
O. 1147 Berlin
Müllerstr. 56
Tel./ Fax. 49 30 5114680

Birayê hêja û xweşevist Mesud!

Silavên germ Berbera, Ciwan û ez ji bona we rîdikin. Em hêvîdarîya xweşbûn, xweşî û bextiyarîya we daxwazdikin.

Em we, Male we û tevaya Dost û Hevalan bi hatina Sersala nuh pîrozdkin. Em hêvîdarin, ku dê hûn vê Sala nuh bi xweşî, bextiyarî û aşîti di nava Kurdistanê de bidin derbaskirin.

Di vê Sala çûyî de rûdanê mêmûyî pir gewre û mezin di mêmûwa Kurdistanâ me de rûdan: Helbijartin, Pêkanîna Encûmena Dewleta Kurdistan û Dazanîna Dewleta Hevgirtî-Fêderasyon ji bona Kurdistanâ Jêrî hate dazanîn.

Her car Kurdan digotin: Sal bi Sal xwezî bi Par. Vê Salê cara pêşî di mêmûwa me de ye, ku em dibêjin: Xwezî bi Îsal.

Hemû Kurd bi vê Dewleta me bextiyarin. Ew hêvî û Armanca Jîna me ye, na hêjî bêtir ew Mirovanîya me bi xwe ye.

Birayê hêja!

Ger em bixwazim, ku ev Dewleta me bête hiştin û bi pêş ve bête xistin, divê em Sînorê wê bidin nîşankirin, Ala Rengîn bidin berz û balakirin û Pûlêñ wê bidin lêdan. Em bivê yanjî nevîn, divê em vê Dewleta xwe bi wan Hersê Bingehêñ Jorî bidin tac û xelatkirin. Dujmin bi xwe ji bona nemana wê yanjî ji bona tackirina wê bi wan Hersê Bingehan dide xebatkirin.

Birayê hêja!

Pir xweşbûn, ew rojênu me bi hev re di nava Dol û Çiyayêñ Kurdistanê de datin rabuhurandin. Min pir bêriya wan û we kirîye.

Par Buharê di Meha Nîsanê de di Rêya Surî de min xwest, ku ez ji bona nik we bêm, belam lihevrist nehat, rê bi min nekevt.

Di vê Sala nuh de careke din di Buharê de, lê vê carê di Rêya Diyarbekrê de ez û Berbera dixwazin ji bona Serdana we bêñ. Heger Berbera Destûrê ji Dibustanê nikaribe bide wergirtin, dê ezê bi tenha xwe bêm.

Di vê Sala çûyî de min pir Nivîstok di warê Mêjûwê de bi Zimanê meyî şêrîn û perest dane wergerandin û ji bona Çapkirinê dane amadekirin. Ez hêvîdarim, ku tevan li dûhev de dê ezê wan bidim çapkirin û belavkirin.

Ez pir dildar û dilbijê dîtina we me. Ez hêvîdarim. ku dê tendurustîya min yarmetîya min bide kirin; ji ber Nexweşîyêñ min ji bextê minî reş her pir dîbin.

Careke din Berbera, Ciwan û ez pir silavan ji bona Mala we û tevaya Dost û Hevalan didin rîkirin û Sersaleke xweş û bextiyar ji we tevan re didin hêvî û daxwazkirin.

Birayê te

Nameyeke vekirî ji bona Mesud Berzanî li ser rûdanên Kurdistana Jêrîn de Birayê Hêja û Xweşevist!

Ez bîr û bawerîyên xwe bi givaştî û hêjî bêtir bi gihaştî ve li ser têghistin û liberkevtina xwe li ser bingehêن tirş û talêن Mêjûwê ji bona ber destêن te didim danîn, da ku belkî piçekî tu sôd ji xwe re ji wan bikaribe bide girtin:

1. Ev rûdanêن tirş, tal, bitirs û malwêran di Kurdistanê de ji dilxwazî û xweziya me azadin. Ew teqendina kombûn û neçarekirina dijbûnê rabuhurandina me ne.
2. Armanca wan ji bal me nediyar û tevlihev hêjî têtin dîtin. Belam ew ji bal Celal Talebanî ve hatine armanckirin û hêjî bêtir ew hatine bernamekirin û hêjî bi serdejî ve ew bi zenebûn û şiyarî ve têtin bicîkirin.
3. Daxwaz û armanca wan li ser serê te ye, na hêjî bêtir ew rast durust ji bona serê têtin ditin; ji ber bêyî vêna Celal Talebanî nikare bi Padışahê Kurdistzanê ve bête kirin.
4. Ger ku ew bi vê armanca xwe ve bête gihaştin yanjî ew neyête gihaştin, bes û bi tenha ve ew bi te ve tête girêdan. Bi saya nezanîya Siyaseta te dê ew bi armanca xwe ve bête gihaştin û tu dê bi gorîyê nezanîya xwe ve bête kirin û hêjî bêtir dê tevaya Binemanala Berzanî û Hemû Berzanî bêtin qirkirin û bi Hezaran Sedhezaran ji Kurdan ve li ser destên Polpotê Celalî bêtin kuştin û Kurdistana rengîn bi Golên Xwînê ve dê bêtin dagirtin. Dê Mêjûvan li ser te bidin nivîsandin: Wî ji Dilpakîya xwe, na ji Nezanîya xwe wî xwe, Binemala Berzanî, Berzanî û bi Hezaran ji baştirîn Keç û Kurêن Kurdistanê dane nabûdkirin; ji ber ku wî bi xurayı ve ew Hêz û Hinera Mezin, Dilsoz, Gernas û Mêrxas ji destên xwe dane berdan û wî ew di roja pêwiste û di cihêن wan de nedan bikaranîn. Wî xwe bi Encûmen û Bangewazîyên hîc û pûç ve xwe didate xapandin. Serpêhatiya wîna mîna serpêhatiya Elî û Meawîya careke din bi hemû tirş û talîyên xwe ve hate vegerandin. Elî bi Dilpakîya xwe ve, na hêjî bêtir û rastir bi nezanîya xwe ve ji bona nerijandina xwîna Musulman ne bes tenê wî xwe, serênen Hesen û Hisêن date liserkirin, lêbelê jî wî piranîya Binemala xwe jî li ser destên Meawî û Zarokêن wî de bigir hemû dane qirkirin. Bi vî rengî ve Binemala Emewî bêtir ji Sed û Sî Salî ve di Welatên Rojhilata Ereb de date serdarîkirin.
5. Celal nebes tenê Hemberê te ye, lêbê ew ji dil û can Dujmin û hêjî bêtir ew bi hemû zanebûn û karêن xwe ve dildar û dilbijokê serê te ye; ji ber vê jî wî ev agirê malwêraniyê di Kurdistana reben û belengaz de di vê gavê de bi xurtî û zanebûn ve dayite lidarxistin, likarxistin û dadan.
6. Ev Agirê hanê bes û bi tenha ve dê bête temirandin, gava ku tu bi pêgîrî ve tevaya Hêz û Hinerêن xwe ji bona pankirina serê vî Xuriyê hanê bide dagirtin û komkirin, yanjî wîna bi Serdarê Kurtêlxwerêن Dergavanê Begdadê bide xelatkirin. Bes û bi tenha ve û bi vî rengî ve Kurdistan bi rast û durust ve xwîn dê lê bête rawestandin. û ew dê ji Polpotan bête rizgarkirin û hêjî bi serdejî ve Gorîyên wê dê bêtin kêmkirin.
7. Evaya rast û durust iro ji te Birayê Hêja tête xwestin. Evaya daxwaza Gorîyên Kurdistanê û Berzanîyê Mezin ji te ye, da ku tu xwe, Milet û Welatê xwe ji van Polpotên Xwînrij û Xwînmijêن Celaliyan bide parastin.
8. Tevaya Deqa Lawazîya te di iro de Birayê Hêja di Dudilî û Dorhêla te de, ya ku te bi bidilbijandî ve li dora xwe de daye komkirin, tête dîtin. Tevaya giringbûn û giranbûna kar û barêن Mêjûyî li ser te de ji bona man û nema te bi neçarî ve li ser te de didin neçarkirin, da ku tu bi kêmtirîn Gorî û kurtirîn Dem bi serkevtinê ve bête xelatkirin, divê ku tu xwe ji vê Dudilî û piranîya dorhêla xweyî hîc û pûç bi lez û bez ve bide rizgarkirin û Dorhela xwe bi zanetirîn, Dilsoztirîn û Mêrxastirîn Dost û Hevalêن xwe ve bide dagirtin. Pir Mirovêن bi nav û bangêن Mejûwê bi gorîyêن Dorhêla xwe ve hatin kirin, ji ber ku ew bi derengî ve pê hatin şiyarkirin.

Berlin, di 23. Mai 1994 de

Birayê te Dr. M. S. Cuma.

Nameyeke vekirî ji bona Mesud Berzanî li ser rûdanên Kurdistana Jêrîn de Birayê Hêja û Xweşevist!

Ez bîr û bawerîyên xwe bi givaştî û hêjî bêtir bi gihaştî ve li ser têgihistin û liberkevtina xwe li ser bingehêن tirş û talîyên Mêjûwê ji bona ber destêن te didim danîn, da ku belkî piçekî tu sûd ji xwe re ji wan bikaribe bide wergirtin:

1. Ev rûdanêن tirş, tal, bitirs û malwêran di Kurdistanê de ji dilxwazî û xweziya me azadin. Ew teqandina kombûn û neçarekirina dijbûnê rabuhurandina me ne.
2. Armanca wan ji bal me nediyar û tevlihev hêjî têtin dîtin. Belam ew ji bal Celal Talebanî ve hatine armanckirin û hêjî bêtir ew hatine bernamekirin û hêjî bi serdejî ve ew bi zanebûn û şiyarî ve têtin bicikirin.
3. Daxwaz û armanca wan li ser serê te ye, na hêjî bêtir ew rast û durust ji bona serê te têtin ditin; ji ber bêyî vêna Celal Talebanî nikare bi Padişahê Kurdistanê ve bête kirin.
4. Ger ku ew bi vê armanca xwe ve bête gihaştin yanjî ew neyête gihaştin, bes û bi tenha ve ew bi te ve tête girêdan. Bi saya nezanîya Siyaseta te dê ew bi armanca xwe ve bête gihaştin û tu dê bi gorîyê nezanîya xwe ve bête kirin û hêjî bêtir dê tevaya Binemala Berzanî û Hemû Berzanî bêtin qirkirin û bi Hezaran Sedhezaran ji Kurdan ve li ser destên Polpotê Celalî dê bêtin kuştin û Kurdistana rengîn bi Golên Xwînê ve dê bêtin dagirtin. Dê Mêjûvan li ser te bidin nivîsandin: Wî ji Dilpakîya xwe, na ji Nezanîya xwe wî xwe, Binemala Berzanî, Berzanî û bi Hezaran ji baştirîn Keç û Kurêن Kurdistanê dane nabûdkirin; ji ber ku wî bi xurayî ve ew Hêz û Hinera Mezin, Dilsoz, Gernas û Mêrxas ji destên xwe dane berdan û wî ew di roja pêwist de û di cihêن wan de nedan bikaranîn. Wî xwe bi Encûmen û Bangewazîyên hîç û pûç ve didate xapandin. Serpêhatîya wîna mîna serpêhatîya Elî û Meawîya careke din bi hemû tirş û talîyên xwe ve hate vegerandin. Elî bi Dilpakîya xwe ve, na hêjî bêtir û rastir bi nezanîya xwe ve ji bona nerijandina xwîna Musulmanan ne bes tenê wî xwe, serêن Hesen û Hisêن date liserkirin, lêbelê jî wî piranîya Binemala xwe jî li ser destên Meawî û Zarokêن wî de bigir hemû dane qirkirin. Bi vî rengî ve Binemala Emewî bêtir ji Sed û Sî Salî ve di Welatên Rojhilata Ereb de date serdarîkirin.
5. Celal nebes tenê Hemberê te ye, lêbelê ew ji dil û can Dujmin û hêjî bêtir ew bi hemû zanebûn û karêن xwe ve dildar û dilbijokê serê te ye; ji ber vê jî wî ev agirê malwêranîyê di Kurdistana reben û belengaz de di vê gavê de bi xurtî û zanebûn ve dayite lidarxistin, likarxistin û dadan.
6. Ev Agirê hanê bes û bi tenha ve dê bête temirandin, gava ku tu bi pêgîrî ve tevaya Hêz û Hinerêن xwe ji bona pankirina serê vî Xuriyê hanê bide dagirtin û komkirin, yanjî gava ku tu wîna bi Serdarê Kurtêlxwerêن Dergehvanê Begdadê bide xelatkirin. Bes û bi tenha ve û bi vî rengî ve Kurdistan bi rast û durust ve xwîn dê lê bête rawestandin. Ew dê ji van Polpotan bête rizgarkirin û Gorîyên wê dê bêtin kêmkirin.
7. Evaya rast û durust iro ji te Birayê Hêja tête xwestin. Evaya daxwaza Gorîyên Kurdistanê û Berzanîyê Mezin ji te ye, da ku tu xwe, Milet û Welatê xwe ji van Polpotê Xwînrij û Xwînmijêن Celalîyan bide parastin.
8. Tevaya Deqa Lawazîya te di iro de Birayê Hêja di Dudilî û Dorhêla te de, ya ku te bi bidilbijandi ve li dora xwe de daye komkirin, tête dîtin. Tevaya giringbûn û giranbûna kar û barêن Mêjûyî li ser te de ji bona man û nema te bi neçarî ve didin neçarkirin, da ku tu bi kêmâtirîn Gorî û kurtirîn Dem bi serkevtinê ve bête xelatkirin, divê ku tu xwe ji vê Dudilî û piranîya dorhêla xweyî hîç û pûç bi lez û bez ve bide rizgarkirin û Dorhêla xwe bi zanetirîn, Dilsoztirîn û Mêrxastirîn Dost û Hevalên xwe ve bide dagirtin. Pir Mirovêن bi nav û bangêن Mejûwê bi gorîyê Dorhêla xwe ve hatin kirin, ji ber ku ew bi derengî ve pê hatin şiyarkirin.

Berlin, di 23. Golana Sala 1994 de

Birayê te Dr. M. S. Cuma.